Newroz Hejmar (74) Rûpel (5) Hizêran 2007z – 2619k

Apê Adîk çû ser dilovanya xwe

Parêzer Mistefa Mecîd

Di Roja 01.06.2007 dengbêj û stranbêjê herêma Efrînê **Adik Hesen Necar** ku weke Apê Adîk dihate naskirin, di 100 saliya xwe de çavên xwe girtin û çû ser dilovaniya xwe. Ew di sala 1907 de ji dayîk bûbû.

Ew du caran zewicî bû, û bavê 7 keç û 3 lawan bû.Cenazeyê Apê Adîk bi toreneke mezin û bi beşdariya zêdetirî 1500 kes li herêma Kurdaxê (Efrînê) li gundê KORA u şêweyek merasimî hate rakirin . Di pêşî de komikik bi cilên filklorî digel qefdên çîçekên reng rengî û tabût li ser milên giropek ji hunermendên kurdaxê hêdî hêdî berve goristana gundê KORA çûn , li wir bi heyamek şînwarî kirin bin axa pîroz û gotinek bi navê xelkî gundê Kora parêzer Mistefa mecîd xwend têde li ser jiyana nemir (ADÎK) û rola wî girîng di parastina filiklor, çand û kultûra kurdî û hunera resen , apê Adîk di jiyana xwe de gelek astengên aborî û rewşeke perişanî borand û jiyana civakî ya wî ne rihet bû birina wî ji du jinan re kêfxweşiya wî têrnekir, piştî berdana jina ya yekê (Xortê) jiyana xwe bi ya din re (zêneb) di tevliheviyekê de derbaskir , xwêş û nexweş , rojekê rind bû û du rojan qeher bû , zêneb zêdetirî (15) salan mirî li dirêjiya wan salan apê Adîk bi tenê di oda xwe de jîna xwe derbaskir tevî ku kurê wî bi çûk (Mistefa) qîmeta bavê xwe rind Dizanî. Lê ewjî û ji ber rewşa ne baş dirêjiya salê li Libnanê bi kar derbasdikir , apê Adîk ne dixast kes xizmeta wî bike heta vê dawiyê karê necariyê dikir û tembûr jî çêdikirin û difrotin ,

Apê Adîk taybetmendiyek di muzîka wî de hebû ew xasiyet bi tena wî ve girêday bû tembûra wî biçûk û (16) perdeyî muzîkek nû avakir û şêweyek cudatir dajot , gava li tembûrê dixist lihev hatinek di navbera tiliyên wî û têlên tembûrê de çêdibû ew dibû sedema ragîhandina afsaneke mûzîkî ,û qijmorekên tîştîşî li ser rûyê wî weke tîpên Mêxî çêroka jiyana wî hewil dide, jiyana tevde êş û nalîn ...

Nivîskarê ku ji nizîk ve jiyana Apê Adîk dişopand, dibêje, wî li ser amûrên muzêkê dida, yek ji wan keman bû lê dev jê berda ji ber ku awazên kemançe jiyana mirov kindike, Apê Adîk xizmete mezin ji strana kurdî ya klasîk re kiribû. Û Gelek stranên weke Memê Alan, Sînema ser bi dûman, Teyar, Seyad Ehmed, Dewrêşê Evdî, Cebelî, Edûlê…û H.W.D .

Ew di jiyana xwe ya mûzîkî de bi stranbêjên wek (Hemûş kûrik , Îbramê Tirko , Cemîl Horo …û, H.W.D) tesîbû û rolek girîng di pêşxistina hunera wî de hebû .

Hezar rihmet li giyana nemir Apê Adîk û bi hêviyên şopa te berdewam be.